

HELÎNA ZAROKAN BIBÎNIN:

Hûn dikarin li navigasyonê – hêlîna zarokan de hemî sazîyên lênêrîna rojane yê zarokan yê kû li Hemeyê ne, bibînin. Li vir hûn dikarin di derbarê ew sazîyan de bêtir agahdarî bistînin û di helîna zarokan kû hûn dixwazin, tê de yek çîheke veqetînin.

Bi vî rengî tê pêk hatin:

- 1. Helîna zarokan bigerin**
- 2. Helîna zarokan hilbijêrin**
- 3. Banga listeya çavdêriyê bikin**
- 4. Têketîna agahdarîyên weliyên qanûnî**
- 5. Têketîna agahdarîyên zarokê**
- 6. Agahdarîyan kontrol bikin û piştrast bikin**

Ger hûn bixwazin, hûn dikarin rewşa rezervasyonê xwe serhêl (online) bibînin. Digel vê yekê, hûn ji bo beşê kû bi şîfre tê parastin, agahdarîyên xwe yê kesane yê têketîna werdigirin. Bi wî awahî hûn dikarin bi amûrekê kû bi înternetê ve hatîye girêdan, xwe qeyd bikin. Her weha hûnê ragihandinên wekî vexwendinekê ji bo naskirina hevûdu an jî pejirandina çîhekê ji bo helîna zarokan, li wê derê de bistînin.

Heke hûn daxwaz bikin, hûn dikarin vê agahîyan bi nameyê bistînin.

Dêûbavên kû înterneta wan nîne, ew dikarin li helîna zarokan de bijartîya xwe berê de bidin qeyd kirin an jî bi termîne çîhê karûbarê me yê li nivîsgaha malbatê de, yek axaftina şîretê pêk bînin. Her weha hûn dikarin di dema serdanên xêrhatîne de rasterast piştî jidayikbûyîna zarokê xwe, yek çîhekê helîna zarokan veqetînin.

Ji kerema xwe di bîra xwe de bihêlin:

Navigasyonê Helîna Zarokan yek sîstema rezervasyonê – serhêl (Online) e kû tê de hûn dikarin di yek listeya navnişanê de, gelek sazîyên gengaz hilbijêrin. Di destpêkê de garantîyekê tune ye kû hûnê di saziya li anegorî dilo xwe de, yek çîhekê lênihêrîna zarokan bibînin. Piştrastkirina girêdanê yek çîhekê tenê bi îmzekirina peymanê lênihêrîna zarokan ve pêk tê.

DI HEBÛNA PIRSAN DE XALA KARÛBARÊ YA KITA-NAVIGATOR ALÛKARIYA WE DIKE

Stadt Herne
Fachbereich Kinder-Jugend-Familie
Familienbüro
Hauptstraße 241
44649 Herne

Telefon 0 23 23 / 16 - 42 40
kita-navigator@herne.de

Duşem heya pêncşem saet 8.00 – 16.00
rojên îni saet 8.00 – 13.00

Ji kerema xwe pêşwext bi têlêfonê randevû çê bikin.

www.herne.de/kita-navigator




Redaksyon:

Weşanvan:
Bajêrê Herne, serokê bajêrvaniyê
Fachbereich Kinder-Jugend-Familie
Hauptstraße 241, 44649 Herne
FB-Kinder-Jugend-Familie@Herne

Kita-Navigator Herne

**Helîna Zarokan bibînin
û rezerve bikin**





DÊÛBAYÊN HÊJA, WELIYÊN QANÛNÎ YÊN HÊJA,



Ma hûn zû û bi hêsanî li cîhekî li Kita yê digerin? Navîgasyona Kita yê dikare di vê warî de alîkariya we bike.

Li Herne, perwerde di destpêka zarokatiyê de dest pê dike. Navendên me yên lênihêrîna rojane (Kita) cihên wusa ne ku meriv tê de bi lîstîkê fêr dibe û ezmûnên yekem yên girîng werdigire. Hûn dikarin bi navîgasyonê Kita'yê li ser berfirehiya pêşniyarên lênihêrîna zarokan yên li bajarê me binerin. Hûn dikarin tiştên ku ji bo zarokê we ji we re girîng in, hilbijêrin: ka rêyên kita kurt in, ka hûn li têgehên taybetî yên perwerdehiyê digerin an jî daxwazên din li pêş in. Hûn dikarin vê portala navendî bikar bînin da ku wêneyek berfireh ya tesîsan bi dest ve bînin û ji bo hewcedariyên zarokê xwe cîhek minasîb bibînin.

Ji bo vê yekê, divê hûn tenê carek xwe tomar bikin û bi vî rengî bikevin nav dabeşkirina navendî ya cîhên li Kita'ya-na de. Ne hewce ye ku hûn li her Kita'yek têkevin nav lîsteya bendewariyê. Ev tê vê wateyê ku dabeşkirina cîh zûtir, hêsantir û zelaltir bûye. Em dixwazin derfetên çêtrîn Ji bo destpêkek baş ya jiyane ji her zarokê li Herne pêşkêş bikin.

Navîgasyona Kita ji bo vê yekê pêkhateyek girîng e.

Bê guman, hûn dikarin wekî berê randevûyekê saz bikin û Kita'ya dilxwaza xwe li cîhê wê nas bikin, ji ber ku têkeliya kesane girîng e û bi taybetî girîng jî dimîne. Lêbelê navîgasyona Kita'yê dikare hilbijartina we hêsantir bike û destpêkek bê strêş ji we û zarokê we re pêk bîne.

Ligel rêzê

Serokê bajêrvaniyê yê we
Dr. Frank Dudda

NAVÎGASYONÊ HELÎNA ZAROKAN

Hûn dikarin li ser navîgasyonê Helîna Zarokan bi merkezi û serhêl (Online) di derbarê hemî helînen zarokan yên li Herneyê, agahdarî bistinin û rezervasyon pek bînin. Li vir hûnê hemî sazîyên lênerîna rojane yên zarokan yên hemî pêşkêşkeran bibînin, divê bila yên şaredariyê bin, divê bila helînen zarokan yên dêrê bin, an jî helînen zarokan yên pêşkêşkerên din bin. Hûn dikarin bikaranîna fonksiyona lêgerînê yek sazîyekê di nêzikê xwe de bibînin. Her sazî pêşniyarîyên xwe, demên lênihêrînê û babetên bingehîn yên pedagojîk, pêşkêş dike. Her weha hûnê ji bo her helîna zarokan yek galerîyekê wêneyan bibînin.

Li ser bingeha daxwazên we û pîvanên pejiwandina cîhekê yê helîna zarokan, zarok bi otomatîk li sazîyên guncan têne belav kirin.

Ger hûn li cem lênerîna rojane yên zarokan an jî li cem yek lênerîna rojane ya mezin yê şaredariyê yek cîhekê digerin, dêûbavên lênerîna rojane yê Herne, dê li ser hejmara telefona

0 23 23 / 3 98 60 54

an jî bajarê Herne li ser hejmara telefona

0 23 23 / 16 - 31 76

alîkariya we bikin.